
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (163):

## Gundê "Ze'irê" koçberkirin û talankirina malmewal û malan, revandina jinekê û girtinên bêsûcane, bîneriyek li ser Hepsa "Çobanbegê - Elra'î", qedexekirina vegera xelkê Gundê "Şêxorzê"





شجرة سنديان معمرة في مزار «شيخ حمزة»- بلبل، قبل وبعد القطع














Di pêvajoya xweşikirin û cîlawkirina dagîrkeriyê de, piropogandeke ragîhandinî bi vegera malbatên koçberbûyî bo cîwarên wan li Herêma Efrînê re tê kirin, lê bi kêmanî gotina li ser qedexekirina vegera bisedan malbatên aniha li herêmê bo gundên wan ên ji Avdara 2018an ve talankirî û koçberbûyî paşguh dike, mîna gundên "Dêrwîş û Çê - N.Reco, Şêxorz - N.Bilbilê, Baflûn û Sînka - N.Şera", ya ku weke beşekê ji rasteqînên guhertina demografî ya rêbazkirî ya li herêmê cîbicîkirî tê jimartin.

Vaye hin binpêkirin û tewanên pêkhatine:

**= G."Ze'irê":**

Li ser pesarê Başûr Ro'avayê Çiyayê "Girê Mezin" dikeve, /2.5/KM ji navenda Navça Bilbilê dûr e, ji /200/mal pêk tê, dora /1200/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, di dema êrîşa dijmantî ya Turkiyê bi ser Herêma Efrînê de tev penaber bûn, tenê jê /30malbat=180nişte/vegerîn, û dora /170malbat=1000nişte/ ji anîndeyan -piraniya wan ji "Xota" ne- têde hatin niştecîkirin.

Artêşa Turkiyê gund topebaran kir, di encamê de piraniya mala hemwelatî "Ehmed Elîko (Ebû Mahêr)" hate roxandin û ziyan gihîşte hejmarek malên din; Milîseya "Firqit Elmu'itesêm" gund desteser dike û Vêla "Mistefa Elîko" ji xwe re kiriye biryargeheke leşkerî, lê Artêşa Turkiyê jî Vêla "Dilovanber Ehmed Miqdad (Bavê Ibrahîm)" ji xwe re kiriye biryargeh.

Piştî penaberbûna xelkê û berî yên vegerîne bighînin gund, piraniya malan hatin dizîn û talankirin, ji firaxên baqirî û qizêzî de bigir ta amûrên elektirîkê, û amûrên pirojeya taqeta "enerciya" elektirîka roniyê ya taybet bi ronîkirina gund (a ku ji /40/tablo, /4/Invêntir û /24/betariyan pêk tê û li 27.4.2017an -weke karekî komelîn-hatiye çêkirin), bi ser de jî dizîna otombîlan û tirektorên çandiniyê.

Weha jî Milîseya "Elmu'itesêm" dest danî ser piraniya malmewalên ên ne li gund û vêrgiyên diravî yên têkel danî ser werzên zeytûnan ên berê, û li 12.9.2020an li ser her malbateke Kurd e li gund maye hezar dolar weke vêrgî ferz kir, û yê ku nede bi qewtandinê ji gund û destdanîna ser malê gef kir. Lê, Milîseya "Ehrar Elşerqiyê" dest danî ser Vêla "Dilovanber Ebid Elreman Reşîd (Bavê Ebdo)" ji xelkê G."Ze'irê" li G."Kefircenê."

Yên vegerîne gund rastî binpêkirinên têkel (mîna girtin, kêmrûmetkirin û têqumandin û tengasîkirinê) hatin, da ku vêrgiyên diravî ji wan bibin û neçar bibin ku gundê xwe berdin, û hin ji girtiyan ji bo serbestberdanê vêrgiyên diravî dan.

Herweha darên ihracê û yên çolê yên kêmdîtî li çiyayên dor gund, /75/darên zeytûnê yên hemwelatiyekî Gundê "Su'iriya" yê hevcîwar û li ser Riya "Ze'irê" - Bilbilê li 28.8.2021an, û darên Zaretgeha "Şêx Hemzê" yên ihracê û temenmezin jê, ji bo êzingkirin û çêkirina komirê, bi şêwakî hovane û bêwijdan hatin qutkirin.

Û herweha jî zaretgeh û hin tirbeyên li dorê hatin wêrankirin û tevdan.

Û ji aliyeke din ve, Hikometa Turkiyê li destpêka sala 2020an, têl û dîwarê sînorî bi kûraniya /300/M û li ser dirêjiya pesarê çiyayê bi ser gund ve, bi hundir Sûriyê ve têveda, sînorên navdewletî yên li ser lihevkirî derbas kir (sînorê ku dîwarê wê yê cudewaz ji dora çar salan ve li aliyê Sûriyê ji herêma navber di nav herdu welatan de hatiye avakirin), da ku çavdêrî û desteserkirin û kontirolkirina artêşa xwe li ser deşt û gundên navçê mekin û pihêt bike.

**= Revandin û girtinên bêsûcane:**

- Ji dema hatiye girtin ve li dawiya Avdara 2018an, piştî vegera hin xelkê gund li çaxa hatiye dagîrkirin, û ta niha çarenûsa hemwelatî "Xoşnav Ne'isan kurê Remzî/30/sal" ji Gundê "Hesen" - Navça Reco ne diyar e; Û bibîr tê jî ku destlatên dagîrker /11/hemwelatî yên temenê wan di navêna /18-45/salan de ji xelkê gund, li navîna Rezbera 2018an girtin, guhestin Wîlayeta "Hetayê" - Turkiyê, bi tuhmetên çêkirî heft ji wan bi hepiskirina heta - heta û çar jî bi /12/salan ceza kirin, û niha jî Dadgeha Lênûvegerê (Neqdê) ya Turkiyê li dozên wan mêze dike.

- Li 12.9.2021an, Milîseya "Firqit Elhemzat" ya ku li Gundê "Kîmarê" - Şêrewa û Havîngeha Çiyayê Elehlam cî girtiye, hemwelatî "Arîn Mihemed Dilî Hesen /25/sal - Ji şeş mehan ve mêrkirî û ducanî" ji gund revand û zorane veşart, û ji bo berdanê ji merivên wê vêrgiyeke diravî dixwaze, û ta niha çarenûsa wê ne xuya ye; Bi bîr tê jî ku "Arîn" berê jî ji aliyê heman milîseyê ve li Reşmeha 2020an hate revandin û di biryargeha "Firqê" de (Avahiya Asayişê ya berê li Hirşê Mehmûdiyê) li Bajarê Efrînê zorane hate veşartin, û di nav giropeke jinên ku jê derketine de bû, piştî ku Milîseya "Ceyş Elîslam" li 28.5.2020an dest danî ser biryargehê, û di dû re jî li 23.12.2020an ji Hepsa Maratê hate berdan.

- Li 12.9.2021an, Asayişê li Navça Reco hemwelatî "Kemal Çolo/55/sal" ji xelkê Gundê "Şêx Mehmedlî - Kerê" girt, û piştî du rojan û dandina vêrgiyeke diravî ew serbest berda.

- Ji heftakê ve, rêbenda çekdar a Milîseya "Firqit Elsultan Melekşah" li Gundê "Çema" - Şera "Mahêr Mihyedîn Miqdad/20/sal" ji xelkê Gundê "Qerebaba" - Navça Reco girt, piştî ku ji Heleb vegerî herêmê da ku derbas Turkiyê bibe, û niha jî /5/ hezar dolar vêrgî ji xwediyan dixwaze da ku berde.

- Li 14.9.2021an, asayişê li Navça Mabeta hemwelatî "Şiyar Xelîl Ebas" ji xelkê Gundê "Birîmce" bi tewanbariya têkliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re girt, û li navenda xwe bend kir, da ku piştî du rojan biguhêze hepseke Bajarê Efrînê, û ji heyvekê ve ji heman gundî hemwelatiya bi navê "Dilyar Osman" jî du rojan girt; Herdu berê jî carekê hatine girtin.

**= Bîneriyek ji Hepsa "Çobanbegê - Elra'î" ya dengbed:**

Destlatên dagîrkeriya Turkiyê beşê mezin ji veşartiyên zorane yên di Hepsa Bajaroka "Çobanbegê - Elra'î" de - Herêma Babê (ya ku Milîseya "Firqit Elsultan Mûrad" bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê wê bi rêve dibe) serbest berdan, piştî qedandina /2-3/ sal bendkirin û şûndaçûna tenduristiya wan ji ber işkencekirinê û mercên sert û dijwar, û piştî derzanên dûhatî ji cîbicîkirina cezayan re û digel baceyên diravî, ji dadgehên wêneyî yên li Efrînê derketî.

Yek ji yên berdayî (ji bo parastina wî em nêv nabêjin) bîneriya xwe li ser girtîgehê û veşartiyên têde weha ji me re pêşkêş kir, û got:

- Girtîgeh ji çend beşan pêk tê, di bin avahiya Hepsa Navendî ya Bajaroka "Çobanbegê - Elra'î" de ye - Herêma Babê.

- Zîndana me ji çend odan pêkdihat, û hejmara me bêtirî sedî bû di ciyekî de.

- Di nav girtiyan de jin û negîhayî hebûn.

- Xwarin pir kêm bû, ji tonên herî bed bûn, û ger ne ji neçariyê be mirov nikane bixwe.

- Paqijî yekcar tunebû, ta asta ku em ji destpêka girtinê ve li Avdara 2018an û ta dawiya heman salê bê serşuştin û guhertina kincan man, ta ku ji me re cilên hepisciyan ên wekhev anîn, wê hîngê cilên me dirîn û hin ji me nîvtazî yan tazî man, deverên şermîn ên hinan hatin xuyakirin, bînên pîs û genî bi ser govdên me ketin, û nexweşiyên eyarî li ser diyar bûn, mîna (gurî, xurandin, kêrmegirtin û belekiya eyarî...HWD) .

- Cûrbecûrên têkel ên işkencekirina derûnî yên kêmrûmetkirina mirov (sixêf û gotinên pîs, hincara pêherşandina cinsî bi jinan...) û hemî rengên işkencekirina govdeyî li dijî me dihatin bikaranîn, ta hincara di dermafê yên negîhayî de yan jî di dermafê diyan de li pêş zaroyên wan; Bi giştî işkencekirin di dermafê girtiyan de ji piştî Nimêja Yasîna de dest pê dikir ta Berbanga Sibê, û her ku işkencekeran (celadan) şêwakî nû ji işkenceyê di'afrandin, kêfa wan pê dihat û pê şanaz dibûn, mîna lêdana bi destan (sîle û kulmist), pihênkirina bi lingan li ser hemî çarçewên govde, hemî rengên lêxistina binpêyan (feleqe), bidarvekirina bidestan an lingan û hîştina govde weha dalewandî û di ber re jî lêdan, pêvenandin û şewtandina bi cixaran an bi alavên germ, û ta cûreyên din ên işkencekirinê yên ku têne bîra mirov; Û hincara jî bêtirî endamekî li ser işkencekirina girtiyekî dibûn hevkar.

- Ji ber işkencekirina mekin, dest, ling, serî û parsiyên hinan şikîn, û govdeyên tevan bi hin ciyan derizîn, reş, şîn û mor bûn, û hin jî seqet bûn û nexweşiyên timî (muzmên)vêre çêbûn.

- Hin girtî di bin işkencekirinê de şehîd ketin, hatin guhestin û di cîne bi dizî de hatin veşartin, bê ku merivên wan werin agahdarkirin, û hin ji ber işkenceyê paşê jiyana xwe ji dest dan.

- Di encama tûşîbûna jinan ji işkencekirina govdeyî û derûnî û pêherşandinên kêmrûmet de, hina hewil dan ku êgir berdin bedena xwe û xwe bikujin.

Bîner gotina xwe weha bi dawî kir û got:"Tiştê min aniye zimên piçek ji piriyê ye, hîn pir tişt hene hema gotina wan tenê porê mirov sipî dike", lê yê vêre jiyaye, bi çavên xwe dîtiyê û bi seriyê wî hatiye gerek çawa bibe, herweha mirov nikane di demeke kin de bi hûrgilî wê şirove bike, ji ber ku tiştên di zîndanên Hepsa Elra'î de bûne, roj û cilde jê re gerek in."

**= Bêserûberî û serberdayetî:**

-Li 13.9.2021an, "Berevaniya Sivîl - Eldîfa'i Elmedenî" got ku tîmên wê agirek li daristaneke Gundê "Kora" - N.Cindirêsê vemirandine, agir ta Berbanga roja din vêketî mabû, û bidehan dar li rûbereke fere şewitandiye.

-Li 14.9.2021an, "Berevaniya Sivîl li Efrînê - Eldîfa'i Elmedenî" got ku bombeyeke teqîner li kêlek otombîleke sivîlî li Bajarê Efrînê (Taxa Eşrefiyê) teqiya, bê ku li tu kesî bikeve.

**= Binpêkirinê virdewêde:**

- Li 11.9.2021an, /35/malbat ji xelkê sê gundên "Şêxorzê" (500mal) - N.Bilbilê yên ku ji dema dagîrkeriyê ve li Avdara 2018an bi tevahî talankirî û ji xelkê wan koçberkirî (ji wan malbatan /33/ li gundên derdorê rûdiniştin û /2/ jî ji Heleb vegerîbûn), hewil dan ku vegerin ser cîwarên xwe, lê Destlatên Dagîrker tenê xirbeliqiyeke ragîhandinî bi haziriya keyayên gundên (Ebûdanê, Dêrsiwanê û Mersa) çêkirin û hin wêne belav kirin, lê rê nedan ku vegerin G."Şêxorzê Jorin" (ê ku di bin destê Artêş û Istîxbaratên Turkiyê de) û G."Şêxorzê Ortê" (ê ku di bin destê milîseyan û anîndeyan de), û tenê malên pênc malbatan li G."Şêxorzê Jêrin" radestî xwediyan kirin, û li 14.9.2021an, du hemwelatiyên ku tevî malbatên xwe ji Heleb vegerîne (yek jê ji "Şêxorzê" û yê din ji "Ebûdanê") jî girtin.

- Di navboriya heftakê de, "Ebdo Osman" serkêşê Milîseya "Hêzên Taybet(Elqiwat Elxase) - Feyleq Elşam" ya li G."Birc ebdalo" - Şêrewa, ev vêrgiyên diravî li ser van hemwelatiyan ("/5/hezar dolar - Fethî Nebî Ebdo bi behaneya ku malmewalên birayê xwe yê mirî bi rêve dibe" û "/2/hezar dolar - Elî Misto - Bavê Şivan, bi behaneya rêvebirina wî ji malmewalên birayên xwe yên ne li gund re " û "/2/hezar dolar jî - Edanan Umer Kuleho, bi behaneya ku wî bi/5/hezar dolar zeviyeke henara bi demane daye") ferz kir; Tê bi bîranîn jî ku ew

serkêşê navborî "Osman" (ê ji Gundê "KeferHeleb" gundewarê Rojavayê Heleb) bi rengekî berdewam vêrgiyên diravî û tiştmiştên din li ser xelkê gund ferz dike.

Tu berdêl -çi bilez an dereng- ji vegera penaber û koçberên Efrînê re bo cîwarên xwe tune ye, û ew mafekî xwezayî û rewa ye, lê di siya nepeydabûna heyamên bi'ewle û hin pêngavên ji bo parastina jiyana wan û peydakirina bingehên jiyanê ta ku bi awakî rêjeyî be jî, çênabe li ser sivîlan bê ferzkirin, û ne ji mafê yekî ye jî qedexe bike.

19.09.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Pirojeya taqeta(enerciya) elektirîka roniyê ya ji bo ronîkirina G."Ze'irê" - N.Bilbilê berî dizînê.
- Vêla "Dilovanber Ehmed Miqdad" li G."Ze'irê" - N.Bilbilê berî ku Artêşa Turkiyê bike biryargeheke leşkerî.
- Dareke Sindiyanê ye temenmezin li Zaretgeha "Şêx Hemzê" - N.Bilbilê, berî û piştî qutkirinê.
- Hemwelatiyê ji Avdara 2018an ve zorane veşartî "Xoşnav Ne'isan kurê Remzî/30/sal" ji xelkê G."Hesen" - N.Reco.
- Hemwelatiya hatiye revandin "Arîn Mihemed Dilî Hesen/25/sal" ji xelkê G."Kîmarê" - Şêrewa.
- Hepsa Bajaroka "Elra'î ya Navendî" - Herêma Babê.
- Şewatek li daristaneke ihracê li dor G."Kora" - N.Cindirêsê.
- Serkêşê Milîseyên "Hêzên taybet (Elqiwat Elxase) - Feyleq Elşam" li G."Bircebdalo" - Şêrewa, yê ku bi "Ebdo Osman" tê navdan.